



Research Article

International Journal of Kurdish Studies

11 (1), pp. 21-37

<http://www.ijoks.com>

Peywendîya Çîrokên Gelêrî û Zarokan di gel Pêşnîyazeke Rêbazên Xwendinê yên Çîrokan

Kenan SUBAŞI¹

Received: Dec 26, 2024

Accepted: Jan 1, 2025

Kurte

Çîrokên gelêrî berhemên vegêrana çanda devkî ne ku ji demên kevin de di nav mirovan de derketiye holê û her çûye geştir bûye. Bi taybetî zîncîreya rûdanê, alema fantastîk, karakterên derasayî û xisûsiyetên din ên vegêrana çîrokên gelêrî ew li ber çavên mirovan bêtir cazîb kirine. Di serî de herçiqas xisûsen û tenê ji bo zarokan nehatibin vegotin jî hema ji wê rojê ve ji bo zarokan bûne vegêranên kêfê û alema xeyalê. Nexasim bi çêbûna qadeke weku edebîyata zarokan ya modern teşebûsên ewil yên materyalên xwendin û tamjêgirtinê çîrokên gelêrî bûne û heya îro jî ev çêj û kêf berdewam dike. Amanca sereke ya vê xebatê destnîşankirin û nirxandina sirra çîrokên gelêrî ya ji bo zarokan e. Me di xebata xwe de çîrokên gelêrî û peywendîya wan a bi zarokan re bi rêbazeke diyakronîk û senkronîk analîz kiriye. Dema ev analîz hat kirin nimûneyên Kurdî yên di vî warî de jî hatine pêşkêşkirin û nirxandin. Herweha mîfa û xetereyên çîrokên gelêrî yên ji bo zarokan ku ji aliyê pedagojîk ve hatine tesbîtîkirin ji layê me ve hatiye pêşkêşkirin. Di gel vê me di xebata xwe de li dervê xwendina klasîk ya çîrokan, rêbazên xwendina nû yên çîrokan jî pêşnîyaz kirine û gihiştine encamê. Weku encam em gihiştin wê qenaetê ku cazîbeya çîrokên gelêrî ji bo zarokan hîn bêtir bûye, ev têkilî bi awayekî xurt hîn dê dewam bike û heta bi qasî xuya dibe dê ne mimkûn be ku zarok ji çîrokan bîn veqetandin.

Bêjeyên Sereke: Çîrokên Gelêrî, Zarok, Edebîyata Zarokan, Vegêran

Recommended citation:

Subaşı, K. (2025). Peywendîya Çîrokên Gelêrî û Zarokan di gel Pêşnîyazeke Rêbazên Xwendinê yên Çîrokan. *International Journal of Kurdish Studies*, Volume 11 (1), 21-37, DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1605278>

¹ Assoc. Prof. Dr., Mardin Artuklu University, Türkiye, e-mail: kenanenado@gmail.com,
ORCID: <https://orcid.org/0000-0001-7744-1646>

Folk Tale Reading Methods Suggestion in the Context of Folk Tale and Children Relationship

Abstract

Folk tales are popular narratives told since the earliest of times. Folk tales became ever more popular as the narrative tradition developed. Especially the plot, world of fantasy, extraordinary characters and other narrative features such as repetition in folk tales have made them the most attractive narrative genre among ordinary people. Although folk tales were not adapted for children at the outset, they seem to have immersed children in an enjoyable world, stirring their imaginations and in general fascinating them for an eternity! We do not know if it was the emergence of children's literature in the modern period that brought about the first efforts to integrate folk tales with tales for children. However, we do know that until today, folk tales have not lost their charm for children. The aim of this study is to examine the educational value of folk tales, especially those for children. In our study, the narrative structures and historical adventures found in folk tales and how they relate to children are analysed using a diachronic and synchronic method. While doing this analysis, the first uses of folk tales in Kurdish children's literature are also shown with examples. In addition, the benefits of folk tales for children in terms of content as well as possible pedagogical harm are also mentioned. In this context, our research concluded by suggesting some creative reading methods in which folk tales could be told to children in unique written publications now in our modern period, as versus their classical narration. It was concluded that children will always find the narrative structure of folk tales attractive and it will not be possible to discard folk tales.

Keywords: Folk tales, Children, Children Literature, Narration

Destpêk

Gotineke giştî ya vegêrannasan heye ku dibêjin her çîrokek (serpêhatîyek), vegêranek e û mirov ji roja ku li ser rûyê dinê bi mirovên din re peywendî danîye û heya niha teşneyê vegêrana serpêhatîyên xwe bûye (Jahn, 2015: 48). Çîrok jî ji wê rojê va ye li ser zar û zimanê mirovan e. Li vir helbet çîrok di maneyê berfireh a vegêranê de hatiye bikaranîn. Lê kifş e ku îroj weku cureyekî “çîrok” bixwe jî ji vê vegêranê nizilîye. Loma ji mîtolojiyê bigire heya her texlîd motîfek di çîrokên gelêrî de xuyane ku ji wê dêrînîyê nifş bi nifş bi xwe re veguhastiye. Lê îroj bi

binyat û forma xwe bûye cureyekî ji cureyên vegêrana gelêrî û herwiha cureyê herî berbelav û pîrnimûne. Di gel vê yekê çîrok di serdema modern de jî bûye çavkanîya herî karîger di perwerdekirina zarokan de.

Di vê xebatê de em ê hêla çîrokên gelêrî ya cazîb ji bo zarokan binirxînin. Gelo ew kengî ji bo zarokan ewqas cazîb bûn. Yan jî berî ku zarokatî ji mezinatîyê hîn nehatibû cudakirin peywendîya çîrok û zarokan çawa bû. Gelo mimkûn e bêyî paşxaneyekê, hema wisa rasterast di sedsala hijdeh û nozdehan de ev vegêran ji bo zarokan hate kifşkirin û bikaranîn. Li dor van pîrsan em ê hem peywendîya zarok û çîrokên gelêrî bi giştî binirxînin hem jî ev peywendî li cem Kurdan çawa pêk hatiye vekolin û destnîşan bikin.

Herweha berî ku em dest bi vê xebatê bikin, li cîhanê jixwe bi gelek awayan çîrokên gelêrî ji bo zarokan hatine bikaranîn û wisa ku ji roja ewil heya niha hê jî di edebîyata zarokan a cîhanê û helbet ya Kurdî de jî cureyekî edebî yê berbelav û balkêş e. Loma di peywendîya çîrok û zarokan de mifa û xetereyên çîrokên gelêrî yên ku dibexşîne zarokan û xwendinên alternatîf yên li ser vî cureyî jî bûye mijara vê xebatê.

1. Peywendîya Zarok û Çîrokên Gelêrî

Di nav jîyana mirovî de zarokatî heya serdema modern jî weku qonaxeke serbixwe nehatibû dîtin. Li gorî Neil Postman di serdema antîk de derbarê zarokatîyê de pir kêmtir tiştên zanîn û heya serdema Arîsto jî li hemberî kuştina zarokên biçûk tu sînor û astengîyeke exlaqî û qanûnî nehatibû derxistin (Postman, 1995: 16-17). Her weku em vê rewşê di alema Rojhelat û Ereban de jî dizanin ka çawa zarokên weku keçik dihatin dinê, bêyî astengîyeke qanûnî û exlaqî dihatin binaxkirin. Herwiha Philippe Ariès îdia dike ku di çaxa navîn de jî derbarê zarokatîyê de tiştek nedihat zanîn û zarok weku kesên kêmtir yanî yên ku hêj mezin nebûne, dihatin zanîn (vgz. Heywood, 2003: 17). Axir keşîfa zarokatîyê, heya sedsalên 15, 16 û 17em ma û di wan çaxan de jî weku serdema modern yan jî îro nehat pênasekirin û weku kesên divê di bin karantînayekê de bên rawestandî, hatin dîtin (Heywood, 2003: 17). Ji bilî van çapxaneyê ne bi awayekî rasterast be jî tesîreke xwe ya erênî çê kir di keşfa zarokatîyê de. Çimkî Postman dibêje ku ji roja çapxane îcad bû û pê ve, divê zarok bi pêş ketibana û bibûna kesên mezin. Ev tişt jî dê bi rêya xwendinê çê bibûya û ji bo fêrbûna xwendinê jî divê ew perwerde bibûna. Li gorî wî bi vî şiklî şaristanîya Ewropayê xwendîngeh ji nû ve saz kirin. Ev sazîkirina jinûve, zarokatî di jîyana mirovî de weku

qonaxeke mecbûrî nîşan da (Postman, 1995: 52). Helbet îroj zarokatî ji qonaxên herî giring ên jîyana mirovî tê hesabandin û herwiha bingeha jîyaneke tekûz a paşeroja mirovî jî.

Ji berê de yanî ji wextê ku zarok hêj nebûbûn zarok, peywendîyeke çîrokan bi wan re hebû yan ev peywendî bi keşîfa zarokatîyê çê bû? Gelo di vê keşîf û pêşketina alema zarokatîyê de çîrok li ku derê bûn? Ji bo zelalbûna van pirsan helbet divê mirov piçekî bala xwe bide rabirdûya çîrokên gelêrî. Gelo ew kengî derketin alema mirovahîyê û çiqas kevin in? Di vê babetê de gotineke giştî ya vegêrannasan heye ku dibêjin her çîrokek/serpêhatîyek, vegêranek e û mirov ji roja ku li ser rûyê dinê bi mirovên din re peywendî danîye û heya niha hewcedarî bi vegêrana serpêhatîyên xwe bûye (Dervişcemaloğlu, 2016: 46; Jahn, 2015: 48). Îcar çîrokên gelêrî jî di rastîya xwe de ev qas qedîm in an na, nayê zanîn. Ji xebatên ku li ser çîrokên gelêrî hatine kirin, yek ji wan xebata bi navê *Kinder und Hausmarchen* (Zarok û Çîrokên Gelêrî yên Malê) a Birayên Grimm e ku ew di pêşgotina vê xebatê de derbarê koka çîrokên gelêrî de dibêjin: “Hin kes dipirsin çavkanîya van ji ku tê? Lê ne şair vê yekê dizanin ne jî mûcîd. Li her derê weku nerîteke ku ji çaxên gelek qedîm ji me re mane, tê zanîn û di nav gelek teorîyan de ya herî maqûl jî bi me ev e (Grimm, 2005: 152). Yanî teorîya ku çîrok ji mîtan nizilîne, maqûltir dibînin û lewma ji bo baş bûn fêhmkirin, li gorî wan divê mît bi awayekî tegez û zelal bûn ravekirin. Lê hêj ev ravekirin bi awayekî tekûz neçûye serî. Herwiha xebateke din a bi navê *The Folktale* (Vegêrana Gelêrî) ya Stith Thompson e ku wî weku “The Folktale in Ancient Literature” (Vegêrana Gelêrî di Çavkanîyên Antîk de) beşek ji bo vê mijarê veqetandîye û çîrokên gelêrî yên qedîm li gorî dabeşkirineke erdnîgarîyê dabeşî çar beşan kirine. Di vê dabeşkirinê de Misira antîk, weku beşek tê destnîşankirin û vegêranên di papîrûsan de weku çavkanîya çîrokên vê serdemê tînan nîşandan ku berî zayînê teqabûlî 2000 salan dikin. Beşeke din weku Babîlî û Asûrî ne ku di deqên fermî û ayînî de mirov digihêje rêça çîrokan ku ew jî me dibe heya 5000 sal berê. Wekî din çîroka epîk a *Gilgameşê* ku ji vê çandê mîras maye weku mînak hatîye nîşankirin ku halê nivîskî yê herî kevin me dibe 650 sal berî zayînê û di eslê xwe de çîrok, a 2000 sal berî zayînê ye. Her du beşên din jî weku Yewnana antîk û Latîn hatine destnîşankirin ku qala *Aesopic Fables* (Fablên Ezop) û *Ovid’s Metamorphoses* (Metemorfozên Ovid) dikin ku di van berheman de em liqayî çîrokên gelêrî tînan (Thompson, 1951: 272-282). Herwiha *Pançatantrayên* Hindî û *Jatakayên* Bûdayî dîsa weku yek ji çavkanîyên herî kevin ên vegêrana gelêrî hatine nîşankirin ku *Pançatantra* herçiqas bi awayekî devkî 2000 sal berî zayînê di nav xelkê de belav bûbin jî wisa tê texmînkirin ku çend sal berî zayînê derbasî nivîsê bûne (Thompson, 1951: 15).

Peywendîya zarokan ya bi çîrokên gelêrî re wisa dixuye ku di peywendêke modern de dikare bê ravekirin. Herçiqas şîyana vegêranê di sê çar salîya zarokan de derdikeve meydana û ew şîyan jî herî zêde bi serborîyên ku ji dê û bavê xwe re tînin ziman û bi çîrokên ku ji dê û bavê xwe guhdarî dîkin, xurt bibe jî weku peywendîyeke xisûsî çîrokên gelêrî di ewilîya xwe de ne tenê ji bo zarokan bûne. Wisa tê zanîn ku fablên Ezop û Beydeba û *Çîrokên Hezar û Yek Şevî* ji ber mebestên cuda hatine vegêran, ne ku xisûsî ji bo zarokan hatine afirandin. Beydeba, *Kelîle û Dîmne* ji bo hikumdarê xwe yê wê çaxê, bi mebesta ku dersên dîdaktîk bi şêwazeke vegêranê fêrî wî bike nivîsîye (Kıbrıs, 2010: 78). Ezop bi mebesta ku nikaribû fikrên xwe bi awayekî azad bîne ziman, lewma ji bo derbirîna fikrên xwe ev rê ceriband û fabl vegêran (Oğuzkan, 2013: 66. Sezer, 2016: 16). Herwiha Şehrazad ji bo ku xwe ji destê Şah Şehrîyar xelas bike û nehêle ku êdî kesekî din bikuje, rêya vegêrana *Çîrokên Hezar û Yek Şevî* hilbijart. Lê rastîyek jî heye ku ji serî de di nav civakê de her cureyê ku hikayetê û meseleyek vegêraye û bi taybetî çîrokan, bala zarokan kêşaye. Çimkî vegêran di her warê jîyanê de xwe nîşan dide û her tiştê ku mirov dixwaze vebêje di nav şêwazeke vegêranê de tîne ziman. Herwiha giringîya vegêranê di çanda mirovahîyê de bi mînakên weku mît, destan û çîrokan nîşan didin. Çimkî vegêran di eslê xwe de amrazek e ku dibe egera keşîfkirina alemên nû û ne tenê bi vegotinê, herwiha bi guhdarîkirinê tekûztir dibe. Lewma mirov tenê tecrubeyên xwe venabêjin û dixwazin ku li tecrubeyên kesên din jî guhdarî bikin. Herwiha vegêran firsendê dide wê yekê ku mirov xeyal bike û rê û tecrubeyên nû nas bike (Dervişcemaloğlu, 2016: 46-48). Ji ber van egeran çîrok ji roja ku derketine, di nav civakê de muheqeq bala zarokan jî kêşaye. Lêbelê cara ewil di vegotin û bikaranîna pend û şîretdayînê de çîrok xisûsî ji bo zarokan di sedsala 18an de hatine dîtin. Ev yek jî bi rêya fablên La Fontaine (1621-1695) tê zanîn. Lewma dema em berhema Jean-Jacques Rousseau ya ku ji bo zarokan bi navê *Emile* nivîsîye dixwînin, em dibînin ku wan çaxan ev fabl ji bo zarokan tên xwendin an jî bi wan didin xwendin. Çimkî Rousseau bixwe rexneyekê li wan fablan dike û dibêje dibe ku zarok tiştên şaş û nebaş jî ji wan fêr bibin (Rousseau, 2011: 76-83). Bi rastî li vir mebesta me ne fikrên Rousseau yên li ser zarok û perwerdeyê ne. Em dixwazin li vir balê bikêşin ser wê yekê ku fabl xisûsî ji bo zarokan weku cureyekî edebî, wî wextî hatîye bikaranîn. Helbet peywendîya zarokan bi çîrokên gelêrî re piştî ku li Almanyayê Birayên Grimm (1812-15), li Skoçyayê Andrew Lang (1844-1912), li Danîmarkayê Hans Christian Andersen (1805-1875) berhevkarîya vî cureyî kirin û ew ji bo zarokan di formên nû de pêşkêş kirin, zêdetir bû (Heywood, 2003: 114). Her ku nêzî roja me bû ev peywendî xurttir bû û mecrayên nû peyda kirin. Êdî çîrokên gelêrî ji aliyê

derûnnas, pedagog û edebîyatnasan ve bûn mijara lêkolînê. Îrroj ji bo geşedana ruhî û zêhnî ya zarokan mît û çîrok weku amrazên herî bikêrhatî tîr nîrxandin. Pedagojîya nûjen li ser wê yekê li hev kirîye ku mît û çîrok bûne bingeş ji bo ku zarok cîhanê û rastîyê şîrove bikin, xwezayê û mirovan di nav rastîya wan de fêhm bikin. Lewma îroj ji aliyê gelek edebîyatnasan ve çîrokên gelêrî ji hêla naverokî, fêrkarî û xeyalî ve ji bo zarokan berhemên pir serkeftî tîr dîtin û listeyên gelek dirêj ji bo mîfayên wan tîr rêzîkirin. Pedagog gihiştine wê qenaetê ku çîrokên gelêrî ji bo zarokan çar erkên xwe hene: ya yekem erka kêfê ye, ya duyem erka psîkolojîk e, ya sêyem erka perwerdekirinê ye û ya çarem erka amadekirina zarokan a ji bo jîyaneke civakî ye (Akdeniz, 2010a). Selahattin Dilidüzgün balê dikişîne ser alema fantastîk û alema rasteqîn ku di gel hev di çîrokên gelêrî de dixuyên. Herwiha karakterên tezaad ên di wan de dixuyên ku ev bi xetêke pir şênber weku baş û xerab ji hev hatine qetandin (Dilidüzgün, 2007: 25-31). Dewlemendkirina alema xeyalî, pêşxistina şîyana vegotin û guhdarîkirinê, peydakirina estetîka edebî, pêşxistina hesasîyeta exlaqî û xwenasîna çandî û neteweyî jî weku mîfayên çîrokên gelêrî yê ji bo zarokan tîr rêzîkirin (Şimşek, 2014: 170-173)

2. Zarokên Kurd û Peywendîya Wan a di gel Çîrokên Gelêrî yê Kurdî

Ji bo ku em bizanin ka zarokatî kengî li cem Kurdan bûye qonaxeke jîyana mirovî, divê em li jîyana wan a civakî ya berê binêrin. Dîroka Kurdan jî weku ya gelek neteweyên Rojhilata Navîn bi pejirandina dînê Îslamê, dibe du parçe: weku dîroka berî Îslamê û ya piştî Îslamê. Her çiqas bê zanîn ku Kurd berî Îslamê li ser vê axê yan jî di navbera her du robarên mezin ên Dîcle û Feratê de jîyabin (Izady, 2007) jî ji ber nebûna çavkanîyeke nivîskî ya tekûz, tam nayê zanîn ka berî Îslamê xwedî civakeke bi çi rengî bûn. Dema ku mirov bigihêje çavkanîyên Avestayî û Pehlewî yê nivîskî, dibe ku tiştine derbarê jîyana civakî ya wê çaxê de bê peydakirin. Li gorî vî esasî mirov pêşî berê xwe bide ayînê Zerdeştîyê, dê bibîne ku ji bo zarokan sê amojgarîyên wan ên sereke hene ku ew jî exlaqê xweş, gotinên xweş û kirinên xweş e. Dîsa di dewra Agirînîyayîş de di خرده /وستا (Xorde Avesta) de ji Ahûra Mazda wiha hatiye lavakirin: “Ey Ahûra Mazda, zarokekî wisa nesîbê min bike ku bi terbiye û zana be. Di nav civakê de xwedîyê berpirsîyarîyê be. Zarokekî kamil ku bikare bi kêrî kesên din bê û bikare ji bo pêşketin û bextewarîya malbat, bajar û welatê xwe bikoşe.” (Vgz. Şecerî, 2005: 28) Herwiha di ketîbeyên *Bîstûn* de hin gotinên Daryûşê Mezin ku xîtabî zarok an şehzadeyên ayende dike, ji aliyê Riza Şecerî (2005) ve wiha

hatine neqilkirin: “Ey kesê ku paşê dê doza şahnişînîyê bike! Xwe ji derewan biparêze. Eger tu bixwazî welatê te payîdar be, her kesê ku derewan bike bi sohtinê ceza bike.” Herwiha hatîye dîyarkirin ku berhemên wê çaxê yên xisûsî ji bo zarokan ku her çiqas ne li gorî pedagojî û edebîyata zarokan a roja me be jî hatine nivîsîn ku çend ji wan ev in: 1. *Enderznameyê Aterpatê Marspendan* an jî *Azerpadê Mêhr Spendan* e ku Şapûrê Duyem ê Sasanîyan ji bo kurê xwe Zeratuşt nivîsîye. 2. Pendên Nûşîrewan ên ji bo kurê wî Hurmuz. 3. Directî Asûrîk (Dara Asûrîk) hîkayeteke di navbera bizinê û dara Asûrîk de ku jê re îroj dara xurmê tê gotin. 4. Pendên Ordîş yên ji bo kurê wî Şapûr (Şecerî, 2005: 31-32) Ji bilî van dîsa di dema Sasanîyan (piştî mîladê 224-652) de tê zanîn ku ji bo rabûn û rûniştina zarokan du berhem hatine nivîsandin. Ev berhem bi zimanê Pazendî ne ku ya yekem bi navê *Hîşkarîyê Rîdekan* ji aliyê Ketayûnê Mazdapûr ve ji bo Farisî hatîye wergerandin û li Tehranê çap bûye. Ev berhem li ser rabûn û rûniştina zarokan e ku tê destnîşankirin ka emelên wan ên li xwendingehê û malê divê çawa bin. Hin ji van kar û baran rengêkî xwe yê dînî jî heye weku paqîjîya serê sibehê, rabûn û rûniştina li ser sifreyê, li xwendingehê hurmeta li hember mamosteyan, guhdarîkirina dersan, helwesta li hemberî dê û bavan û mezinan, edeba xwarinê û tiştên bi vî rengî. Berhema duyem bi navê *Andarz- î Weh Kunēm Aşmā Kōdakān* (Enderzî xûbî konem be şoma kûdekan/Şîretên xweş li we bikim zarokino) ji bo Farisî hatîye wergerandin. Ji hêla naverokê ve jî ev berhem dîsa kêr zêde weku ya din tê ravekirin (Yıldırım, 2017: 460-461). Wisa dixuye ku ev berhem zêdetir ji bo zarokên ji çîna malmezinan hatine nivîsandin. Di vê bareyê de Şecerî jî nîşan dike ku zarokên ji çîna jêrîn û navîn a civakê ji dersxwendin, fêrbûna ilm û zanîna bê par bûne û di gel wê berhemên dînî û pendname, xwendin û dersdarî ji bo zarokên mîr û fermanîdar û malmezinan bûye (Şecerî, 2005: 30-31). Axir ya giring di vir de jî bo me ew e ku Kurd jî yek ji wan qewman e ku di serdema Zerdeştî û Sasanîyan de li vê deverê jîyane û wan jî vê çandê sûd wergirtîye. Lewma em dikarin bibêjin ku berhemên bi vî rengî, dikarin bibin nîşaneyek bo têgehiştina zarokatîyê ya wê serdemê ya di nav Kurdan de. Her çiqas zarokatîya wê serdemê weku zarokatîya îroroj nehatibe hesibandin jî, ji bo me nîşaneyên giring in di dîroka Kurdan de.

Bi pejirandina Îslamê, perwerde û zarokatî dikeve mecra yeke nû helbet. Bi taybetî bi avakirina medreseyan, qedrê perwerdeyê di civakê de bilindtir dibe. Lewma di dînê Îslamê de sîyaneteke gelek zêde ji bo çîna aliman hebû. Xwendin, hînbûn hem ji ber vê egerê hem jî ji ber ku fermaneke Xwedayî dihat dîtin, bi saya medreseyan tekûztir û zêdetir belav bû. Li Kurdistanê jî

bi taybetî pêşî di serdema Şeddadî, Merwanî û Eyûbîyan de û paşê jî di serdemên mîrektîyan de gelek medrese hatin avakirin û perwerde bi vî awayî pir belav bû (Bedlîsî, 2007; Aykaç, 2020: 172-182). Medreseyê bi xwe re çemka feqîtiyê afirand ku ev qonax bi zarokatîyê re pir peywendîdar bû û heya roja me jî vê yekê dewam kirîye. Bi taybetî ferhengên manzûm ên ku ji hêla Ehmedê Xanî (1651-1707), Îsmailê Bazîdî (1655-1710), Şêx Ehmedê Nodeyî (1753-1837), Şêx Mihemedê Kerbelayî (1886-1939) û hwd. ve hatine nivîsandin weku kanoneke pedagojîk a medreseyan dikare bê hesibandin. Helbet ev ferheng rasterast ji bo perwerdekirina zarokan bû ku Ehmedê Xanî ev yek di Nûbihara Biçûkan (1683) de di beşa girîzgahê di malika 7an de wiha anîye ziman: “Ne ji bo(y) sahib rewacan. Belkî ji bo(y) biçûkêd Kirmancan.” (Xanî, 1858)

Ji bilî medreseyan hêlêke din a perwerdeyê malbat û civak bû. Her çiqas di serî de bi taybetî ji bo zarokan nehatibin gotin jî weku çanda şevbuhurîyê mît, efsane, destan û çîrokên ku di nav malan de dihatin vegêran, zarokan jî jixwe bêpar nedihîştin. Lê cara ewil weku li cîhanê di nav neteweyên din de jî hatîye tecrubekirin, bikaranîna çîrokên gelêrî ya rasterast ji bo zarokan di nav civaka Kurdan de, bi destpêka bayê nûjenbûnê tê dîtin. Bi taybetî bi derketina rojname û kovarên Kurdî yên di serê sedsala 20an de em dibînin ku zarokatî weku qonaxê giring tê nîrxandin û ji bo perwerdeya zarokan di rojname û kovaran de nivîs tên weşandin. Di serî de di rojnameya *Kurdistanê* de Mîqdad Mîdhet Bedirxan (1898: 1-4) dubare li ser wê yekê radiweste ku divê Kurd zarokên xwe bişînin xwendîngehan û li welat û gundên xwe xwendîngeh û medreseyan ava bikin. Di kovara Kurdî ya yekem a bi navê *Rojî Kurdê* (1913) de bi navê “Mindall bo Çî Zû Fêrî Xundin Nabê” ji alîyê Silêmanî Ebdulkerîm ve nivîsek tê nivîsandin û tê de hin tesbîtên paşdemayîna pratîka xwendîne ya zarokên Kurdan tê kirin. Herwiha di hejmara sêyem û çarem de çîrokek û qisetek tê nivîsandin. Ji bilî van di rojnameya *Bangî Kurdistan* (1922-26), *Rojî Kurdistan* (1922-23) û di kovara *Zarî Kirmancî* (1925-32) de bi heman mebesta fêrkari, terbiye û xwendina zarokan nivîs hatine nivîsandin (Sebrî, 2010: 38-40). Helbet kovara *Hawarê* (1932-43) û *Gelawêjê* (1939-49) du berhemên pir giring in ji bo bikaranîna sistematîk a çîrokên gelêrî di perwerde û xwendina zarokên Kurdan de. Di her du kovaran de ji bo zarokan stûnên taybet hatibûn veqetandin. Di sala 1946an de yekem kovara zarokan a Kurdî ya bi navê *Girr û Gallî Mindallanî Kurd* weşîya û tê de wergerên ji La Fontaine û Tagore (1861-1941) weşîyan ku ev nîşaneyêke pir giring e ji bo peywendîya çîrokên gelêrî û zarokên Kurdan (Subaşı, 2018: 113-117). Dîsa li cem Kurdên Sovyetê di perwerdeya Kurdî da çîrokên gelêrî û bikaranîna wan di kitêbên dersê de yan jî ji çîrokan çekirina berhemên serbixwe û wergerandina çîrokên gelêrî yên

milletên cîran ji bo Kurdî nîşana bikaranîneke xurt ya çîrokên gelêrî bo zarokan e. Dîsa di salên 1930î û 40î de çîroknivîsîya Şakir Fettah û Elaeddîn Seccadî ya ji bo zarokan nîşanî me dide ku çawan di bin tesîra çîrokên gelêrî de mane (Berzincî, 2004: 385-408; Seccadî, 1960). Êdî weşandina pirtûkên çîrokên gelêrî, adaptekirina wan ya li ser kartonfilman û bidengkirina wan îrroj rêbazên cuda yên bikaranîna çîrokên gelêrî ne di perwerdeya zarokan de. Herweha rêbazên ceribandî û asayî ne.

3. Mifa û Xetereyên Çîrokên Gelêrî ji bo Zarokan

Weku me berê jî amaje pê kirî, çîrokên gelêrî di eslê xwe de bi taybetî ji bo zarokan nedihatîn gotin. Lêbelê bi serdema modern re zarok bûn mixatabên herî berbiçav yên çîrokên gelêrî. Helbet sedema sereke ya vê têkiliyê perwerdekirina zarokan bû. Perwerdekirina bi rêya vegêran û edebîyatê.

Tiştê ku di çîrokên gelêrî de kêfa zarokan tîne hêla wan a fantastîk û binyada wan a vegêranê ye. Rastî û xeyal di jîyana zarokên xisûsen (4 û 8 salî) de carinan heta gelek caran tevlihev in. Yanî zarok jîyana rasteqîn û efsûnî baş ji hev dernaxin. Ev jî dibe xaleke din a balkêş a çîrokên gelêrî ji bo zarokan. Çimkî lehengên fantastîk li ser vê esasê tîne afirandin û di çîrokên Kurdî de lehengên weku Mîrze Mihemed, Rustemê Zal û di edebîyata cîhanê de lehengên weku Superman, Thor û hwd. mînakên vê xalê ne. Zarok weku mezinan peywendîyeke mantiqî di nav rastîyan de danînin. Loma pir zû dikevin bin tesîra lehengên fantastîk. Çimkî ew di nav fantazyayê û rastîyê de diçin û tîne. Her ku mezin dibin fantazyayê kêm dibe, rastî bêtir dibe. Çimkî ji aliyê kirariya hişî ve jî fikirîna şênber hêdî hêdî ber bi fikirîna razber diqulibe ku ev yek di geşedana zarokan de qebûleke berçav e (Bacanlı, 2005: 66-70; Yavuzer, 2012: 225-232).

Çîrokên gelêrî ji aliyekî ve jî weku modeleke biçûk a jîyana rasteqîn in. Tim li ser dijberîyan ava dibe bo nimûne baş-xerab, feqîr-dewlemend, zalim-mezlûm, saf-fêlbaz û hwd. Ev jî nêzî rastîya zarokan e. Çimkî ew heya demekê dualî li dinyayê dinêrin, ne ku piralî. Loma çîrok vegêraneke alîkar e bo têgihiştina jîyanê. Derbarê jîyanê de zarok perwerde dibe, tecrubeyan dibîne û agahiyan werdigire. Tiştê herî balkêş jî karakterên baş bi ser dikevin û yên xerab jî tîk diçin. Ev nêzî alema zarokan e ku gelek anîmasyonên televîzyonê jî li ser vê yekê ava dibin.

Dîsa xwendina dubare ya çîrokekê ji hêla zarokan ve, ne tenê ji ber zarokatîya wan e, teknîka dubarekerina vegêranê ku jê re frekansa vegêranê jî tê gotin (Genette, 2011: 118) bê şik xwedî tesîr e. Bo nimûne têgihiştina çîrokên ajelan û zincîreyî li beramber çîrokên eslî ji bo zarokan hêsanîr e. Çimkî tê de teknîka sêbareyê gelek hatiye bikaranîn. Qesda me ji teknîka sêbareyê tiştê ku carekê pêk hatibe vegêrana wî ya bi çend caran e. Bo nimûne di Şengê û Pengê de dubarebûna “Şenga min, Penga min, dayîk çûye zozana, xwariye pelê kizwana, şîr ketîye guhana, de werin dana” bi çend caran nîşana vê ye. Dîsa di çîroka “Pîrê û Rovî” de dema ku dêla rovî qut dibe, rovî ji bo ku dêla xwe ji pîrê bistîne divê şîrê pîrê lê vegerîne, îcar bi dorê diçe cem bizinê, darê, avê, keçikan, çerçî, mirîşk, cotkar û her carê jî daxwaza xwe bi heman rengî tîne ziman: “hatime tu genim bidî min, genim bidime mirîşkê, mirîşk hêk bide min, hêk bidime çerçî, çerçî gustîl û bazinan bide min, gustîl û bazinan bidime keçikan, ew jî bîn li ser çem govendê bigerînin, çem jî av bide min, av bidime darê, dar jî çilo bide min, çilo bidime bizinê, bizin şîr bide min, şîr bidime pîrê, pîrê dêla min bide min da ku hevalê min nebêjin quto muto dûvquloto tu ku da hatî wê da here.” Ji ber ku ev gelek caran dubare dibe, kêfa zarokan bi wê vegêranê tîne û mînakên bi vî rengî di çîrokên gelêrî da gelek in.

Bikaranîna axaftina yekser di çîrokan de nîşanê me dide ku muhakeme û fikra şênber serdest e ku ev yek jî balkêşîya çîrokan ji bo zarokan careke din diselmîne. Zimanê diyalogan pir nêzî zimanê rojane ye. Erkeke diyalogan hêsanîkirina xwendinê ye (vgz. Mentik, 2013: 163). Ji ber ku diyalog bi piranî kurt in, xwîner ji xwendina wan bêzar nabe an jî monotonîya xwendinê pê dişkê. Ev taybetî ji bo xwînerên temenbiçûk ango zarokan taybetîyeke giring e.

Karakterên çîrokan temsîliyetên mirovên rasteqîn in. Loma gelek caran ji bo zarokan dibin rolmodel. Herweha karakterên çîrokan rast in: tîpîk, karîkatur û komîk (humorous) in. Zarok heya dozdeh salîya xwe di heyama teqlîdê de ne û karakterên di çîrokan de vê yekê mimkûn dîkin. Bi taybetî dualîbûna karakteran û şerê di navbera başî û xerabîyê de ji ber ku pir zelal e, tesîreke mezin li teqlîd û rol-modelîyê dike.

Heke em berê xwe ji aliyê rûdanê ve jî bidin çîrokan em ê bibînin ku rûdan zincîreyî ye. Şayesandin kêr, aksiyon pir e. Zarokên berî dozdeh salî di konsantre û balê de kûr nabin. Loma rûdanên kompleks dê zehmet be ji bo wan. Ji ber vê egerê ye ku bi piranî kitêbên ji bo zarokên vî

temenî tèn wênekirin da ku balê bêtir bikêşe ango bala zarokan di nav peyv û hevokan de belawela neke. Dîsa dirêjnebûna teswîrên di çîrokên gelêrî de jî nimûneyek e ji bo vê xalê. Teswîrên dirêj bal û konsantreyeke xurt divên, lê di çîrokên de jî bi piranî teswîr gelek kurt in. Ev yek dike ku zarok bi hêsanî û kêfxweşî guh bidin yan wan bixwînin.

Di gel van xisûsiyetên balkêş yên çîrokên ji bo zarokan em dikarin pê re peywendîdar hin mifayên çîrokên yên ji bo zarokan jî destnîşan bikin. Ji bo xwenasînê, bixwebawerîyê, nasîna jîyanê ji hêla aborî, civakî, exlaqî û hwd. ve nimûneyên bikêrhatî ne. Herweha weku hemû berhemên serkeftî yên edebîyatê, çîrokên gelêrî jî xûy û hezkirina xwendinê di dilê zarokan de diçine. Ji bilî vê, geşedana zêhnî (şênber) û ruhî bi pêş dixê. Zarok alema xwe ya hundurîn di nav çîrokên de dibînin û bêtir ku hay jê hebin dikevin nav wê pevçûna di rûdanê de di gel leheng. Yanî dibin rêhevalê leheng û bi xerabîyê re şer dikin. Dîsa di çîrokên gelêrî de weku me berê jî gotibû jîyan ne bi hûrgiliyên xwe, serra serra tê dayîn. Jixwe zarok jî jîyanê bi hew qas hûrgilî nanirxînin. Loma ew pêşî jîyan û dinyayê di nav wê yekûnê de têdigihêjin û bere bere ji hev vediçirînin. Di çîrokên gelêrî de bi qasî xeraban baş jî hene ku ev îşaretî rastîya jîyanê dike û micadele dîsa xaleke giring e di vê noqteyê de. Lê heya micadeleyeke saxlem neyê kirin encameke baş nayê pêşîya leheng. Dibe ku meriv carinan wîndî bike, lê divê dev ji micadeleyê bernede. Yanî şert û mercên baş û xeraban di çîrokên de yeksan in (Dilidüzgün, 2007: 38-41). Mîzah û karîkaturîzekirin ji hêla fikirîna afirîner û rexneyî ve muhîm in. Di nav çîrokên gelêrî de fêlbazîyên rovî yên ku dibin bela serê wî, quretîya şêr a ku pê dibe qirdikê mişk û kîroşkan, keçelokê ku weku ehmeq dixuye lê gelek kesan bi aqilê xwe dixapîne, nimûneyên balkêş yên vê xalê ne. Îcar em vê xisûsiyeta çîrokên gelêrî di nav edebîyata zarokan a Kurdî ya modern de jî dibînin. Çetoyê Zêdo yek ji wan nivîskaran e ku ji binyada vegêranê ya çîrokên gelêrî gelek sûd wergirtiye û karakterên di çîrokên xwe de dike mijara mîzah û pêkenînê. *Şêrê Bitenê* û *Ejderhayê Tirsonê* du berhemên bi vî rengî ne. *Şêrê bitenê* biryar dide ku bibe vejeteryan, loma bi tenê dimîne kes pê ra hevaltîyê nake. Lê di dawîyê de weku tobeya gur ew jî mecbûr dimîne tobeya xwe xerab bike. Ejder û dînozorên ku zarok wehşetnak dibînin li cem Zêdo bûye newêrekeke daristan û şevê. (bnr. Zêdo, 2020; 2023).

Bêguman di çîrokên gelêrî de hin xisûsiyetên mimkûn e zirarê bide zarokan jî hene. Di gel ku zarok ji serdemên kevin de muxatabên van vegêranan in jî di serdema modern de bi pêşketina

pedagojîyê û weku serbixwe derketina holê ya serdema zarokatiyê ku divê ji mezinan cudatir miemele li wan hatiba kirin (Öztañ, 2011: 20-26) van xisûsiyetên mimkûn e zirarê bigihîne zarokan bêtir xuyanî kir.

Îcar li gorî vê nêrînê hatiye tecrubekirin ku çîrokên gelêrî zarokan pir zêde dikêşe nav fantazyayê û wan ji rastiye dûr dixîne. Xisûsen çîrokên derasayî mînak in bo vê rewşê. Heke ew dengeya jiyana rasteqîn û fantastîk neyê danîn, mimkûn e zarok bawerî bi jiyana fantastîk bînin û zirarê bigihînin xwe. Dîsa tîrsa zêde ne hewce ye. Yan jî nîşandana karakterên xerab ne bi awayekî hovane û weşîyane bê kirin. Çimkî di çîrokên gelêrî de cezakirina pîra cadû, şerê di gel dêwan vê yekê nîşan didin. Belkî ya herî muhîm jî tîrsa di çîrokên de nebe rêbaza perwerdekirina bi tîrsê û kontrolkirina zarokan. Divê gelek karakterên weku pîrê, dêw, zîha, sêhrbaz û hwd. ji tundûtîjîyê dûr bînin sêwirandin. Divê ew bînin karîkaturîzekirin. Lê bi temamî ji nav jiyana zarokan nayê derxistin helbet. Bi her awayî zarok dê bi wan re muxatab bibin jixwe. Li medyayê yan li mecrayên din. Loma ne ku bi temamî meriv wan heyînan ji zarokan veşêre, lê bi awayekî maqûl nîşan bide.

Aliyekî xetereyê jî bêguman li gorî nêrîna modern nesîhetamêzîya çîrokên gelêrî ye. Ew ji çanda devkî ne û ji çerxa perwerdeya gelêrî nizilîne. Loma tê de li gorî serdema modern şîretamêzî û nesîhetparêzîyeke zal heye. Mimkûn e ev doza wê zêde be. Ev yek jî li dijî nêrîna modern e ya ku zarok dixê navenda jiyane, dixwaze ew bixwe bi biryarên xwe rabe, azad be ji hemû otorîteyan. Ev mîfa û xetereyên çîrokên gelêrî yê ku me li jor rêz kirin, salên dirêj in ji aliyê pedagojî û edebîyatnasan ve tînin nîqaşkirin. Helbet kêma zêde lihevkiyê hebe jî dîsa nêzîkatîyên cuda ji xwe nîşan didin. Hem jî bo bertêrfkirina xetereyên çîrokên gelêrî hem jî ji bo biriqandin û derxistina pêş ya mîfayên wan kesên pispor yê di vî warî de rabûne rêbazên xwendinê yê cuda yê çîrokên gelêrî pêşkêş kirine. Ev rêbaz hem jî bo gihiştina xwendineke serkeftî ye hem jî çêjwergirtina ji xwendina çîrokên gelêrî ye.

4. Çend Rêbazên Xwendinê yê Çîrokên Gelêrî ji bo Zarokan

Di bin vî sernavî de em ê çend rêbazên xwendinê yê nû yê çîrokên gelêrî pêşkêş bikin ku di eslê xwe de îroj ev rêbaz di komxebatên nivîskarîya dahêner de tînin bikaranîn. Amanc li vir

bipêşxistina hêza sêwirandinê û xeyalê ya zarokan e. Herweha tevlîkirina zarokan bi awayekî aktîf di nav perwerdeyê de ye. Bêguman ji bo bipêşxistina xweîfadekirinê jî ev rêbaz tên bikaranîn. Meriv dikare van rêbazan bi kurtî wiha destnîşan bike:

Guherandina Eslê Çîrokê yan Peyama Sereke

Di çanda klasîk de mirovan çîrok bêtir li ser peyameke sabît dixwendin û dixwestin peyama bi dilê xwe jê derxînin. Dema em rexneya modern ya J. J. Rousseau (2011: 81) ya ku li fablên La Fontaine kirî jî dinêrin, em li dijîderketina xwendina çîrokan li ser peyameke sabît dibînin. Her zarokek di alema xwe ya hundirîn û derva de ji hev cuda ye. Dibe ku meriv berê wan bide peyamên din ê di çîrvanokan de. Mesela di *Şengê û Pengê* de, bi qasî ku gur nebaş û dijmin e, hewqas jî Şengê û Pengê bê sebr û bê tevdîr in. Herweha Bizina Dê ne kêmtî wan e ku çawa wan tenê li malê dihêle û diçe çêre. Loma meriv dikare ji zarokan bixwaze ka li derveyî peyama sereke xeletî, sûc, xuy û xisletên cuda yên karakterên din peyda bikin û li ser biaxivin.

Texmînkirina Berî Çîrokê û Domadin an jî Encamkirina Çîrokê

Li vir amanc bipêşxistina xeyalên zarokan e û kifşkirina aliyên wan ên veşartî û bixwehesîna wan e. Li vir mamosta, rêberek yan jî mezinek pêşî li ser babeta çîrokê diaxivin. Helbet çîrok jî bi çend caran tê xwendin. Piştî vê sohbetê ew rêber dikare ji zarokan bixwaze ka gelo berî çîrokê mimkûn e çi bûbe. Dîsa bi heman awayî piştî ku çîrok xelas bû, pirsar “Gelo paşê çi bû?” dikare arasteyî zarokan bike û bixwaze ku ew li gorî xwe çîrokê bidomînin. Bo nimûne berî ku Şengê û Pengê ji dêya xwe bibin, yan jî dêya wan ew li malê bihêle û biçe, ew li ku derê bûn û çawan dijiyan? Bi pirsên bi vî rengî ev rêbaz tê tetbîqkirin.

Parodîkirina Çîrokan

Parodî bêtir ku teşe û binyada tiştekî bê xerabkirin veguherîna wî tiştî yan jî henekpêkirina wî tiştî ye. Îcar di vê çarçoveyê de nûjenkirina çîrokê li ser binyada vegêrana wê ya resen weku vegêr, karakter, zîncîreya rûdanê, dem û cih û henekpêkirina karakteran û rexnekirina wan dibe ku parodiyên çîrokê bîn sazkin. Helbet berî vê divê zarok ji aliyê hunera parodiyê ve bîn

perwerdekirin û çend mînak di gel wan bê çêkirin û paşê ji wan jî nimûneyên parodîkirina çîrokên gelêrî bê xwestin. Bo nimûne parodîyeke Sindrellayê hatiye çêkirin ku dêmarîya wê û Sîndrella ji hev hez nakin. Li ser vê yekê Sîndrella bi xwe malê diterikîne diçe û dibe mêvanê heft muzîkjenan. Li wir jiyana wê dikeve duzenê û asayî dibe, lê dêmarî li wir jî li pey dikeve û pirî bi ser de diçe Sindrella dest bi madeyên hişbir dike ji ber stresa dêmarîya xwe. Herî dawî li nexweşxaneyê bijîşkekî qeşeng nas dike û bijîşk wê ji nav lepên madeyên hişber xelas dike û ew dibe prensê Sindrellayê û parodî diqede (Dilidüzgün: 2007: 33-34). Helbet meriv dikare parodîya Şengê û Pengê jî bisêwirîne. Vê carê li bajarekî modern dê û bavên zarokan wan teslîmî servîsa dibistanê dikin, lêbelê xwedîyê servîsê weku gur merivekî xerab derdikeve û Şengê û Pengêya zarok ku êdî ne karik in, lê zarok in, direvîne û ji malbatê fîdye dixwaze û li ser vê yekê micadeleya malbatê dest pê dike û polîsan agahdar dikin û rûdan bi vî şiklî bi pêş dikeve.

Helbestnivîsandin

Li vir amanc bipêşxistina şiyana nivîsînê ye li cem zarokan. Bêguman di gel zarokan dîsa rêberek yan mamostayek heye û pêşî çîrok carek bi deng carek jî bédeng tên xwendin. An jî dikare çend caran bê xwendin. Paşê derbarê çîrokê de sohbet û nîqaş tê kirin. Piştî mamosta ji zarokan dixwaze ku ew bi rêbaza brain-storm/bahoza hizrî derbarê çîrokê de çi bê aqilê wan yan jî çi hîs dikin bîn li ser depê binivîsin û her kesek peyvên xwe li ser depê yan lînûskên xwe dinivîse. Herî dawî bi awayekî serbest derveyî çîrokê yan bi çîrokê re eleqedar mamosta dikare ji zarokan bixwaze ew helbestekê binivîsin û ji hev re helbestên hev bixwînin.

Dramaya Dahêner

Çîrokên Gelêrî vegêrana herî zêde nêzî şano û dramayê ye. Xisûsen ew xalên vegêrana çîrokê yên me behskirî vê yekê nîşanî me didin. Îcar pir bi rehetî çîrokeke gelêrî xisûsen yên ajelan bibe senaryoyeke dramayê û zarok bikevin şûna karakteran û aksîyona wan bi tevgerên xwe pêk bînin. Helbet di vir de jî mamosta weku rêberek pêşî bi hin rêbazên weku Propp û Greimas zîncîreya rûdanê û peywendîya karakteran bi zarokan re analîz dike (Subaşı, 2019: 91-137) û wan li ber dixe ka çîrokek mimkûn e çawa bi pêş bikeve û karakter di kîjan qadan de xuya dibin. Helbet piştî vê perwerdeyê rêber dikare rolên karakteran di nav komeke zarokan de parî bike û bi qasî

hefteyek yan du hefte wextê amadehiyê bide bi wan û paşê rojekê di dersê de çîroka hatî hîlbijartin bi zarokan bide listin.

Encam

Çawa li cîhanê bi giştî çîrok çandê berbelav a tradîsyona devkî û nivîskî bû, wisa jî em têgihiştin ku li erdnîgarîya Kurdan jî hem ji hêla nerîta devkî hem jî ya nivîskî ve ne kêmi milletên din bûye. Hêza çîrokên gelêrî me di mînakên ewil ên çîroknûsîya modern ya Kurdan de jî dît ku dema Kurdan dest bi çîroknûsîya nû kiriye heya demeke dirêj xwe ji vê nerîta devkî tam azad nekirine. Helbet li cihê ku perwerdeya kurdî hebûye herweku başûrê Kurdistanê, li nav Kurdên Sovyetê me dît ku ji bo zarokan dema materyalên edebî yê xwendinê hatine amadekirin, ji çîrokên gelêrî yê Kurdî û bi rêya wergerê ji yê milletên din hatiye îstifadekirin. Dîsa peywendîya çîrok û vegêranê û bi heman şiklî peywendîya mirov û vegêranê ne peywendîyeke basît û demkurt bûye. Loma em bi rahatî dikarin bibêjin binyada vegêranê ya çîrokan bûye aliyekî wan ê herî xurt di berdewamî û nerîtbûna wê de. Vê xisûsiyetê di gel mezinan zarokan jî cezb kiriye û zarok jî pêşî di nav mezinan de paşê bi serê xwe bi pêşketina çanda xwendin û nivîsandinê, bi perwerdeya dibistanên modern peywendîya xwe û zewq û kêfa çîrokan nîşan daye. Bi taybetî bi pêşketina zanista pedagojîyê û nasîna serdema zarokatîyê ji aliyê geşedana zêhnî û zimanî ve peywendîya zarok û çîrokên gelêrî baştir hatiye famkirin. Wisa bûye ku êdî mifa û zirarên çîrokên gelêrî ji hev hatine derxistin, ka kîjan aliyê wan bo geşedane baş e kîjan xetere ye, ev hatine tesbîtkirin. Hêza çîrokê bi vê yekê jî nemaye û bi guherîna nêrîna mirovan ya li ser zarokan û ketina zarokan ya di navenda jiyanê de nêrîneke nû ji bo xwendina çîrokên gelêrî peyda bûye. Li dor vê nêrînê bi dehan rêbazên xwendinê yê nû derketine ku me jî di vê xebatê de çendek ji wan bi pênase û nimûneyan nîşan dan.

Çavkanî

- Akdeniz, S. (2010a). *Bir Masal İnceleme Modeli Önerisi ve Uygulama*, <http://www.ege-edebiyat.org/wp/?p=771> (Erişim Tarihi: 11.02.2019).
- Aykaç, Y. (2020). *Kürt Mirliklerinde Edebi Patronaj (1514-1846)*. Yayınlanmamış Doktora Tezi, Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- Bacanlı, H. (2005). *Gelişim ve Öğrenme*, 11. Baskı, Ankara: Nobel Yayın Dağıtım.

- Bedirxan, M. M. (1898). BismîllehîRehmanîRehîm, *Kurdistan*, M. E. Bozaslan (Amd.), hej: 1, Kahîre, 1-4.
- Bedlîsî, Ş. (2007). *Şerefname*, Z. Avcı (Çev.), İstanbul: Avesta Yayınları.
- Berzincî, E. S. E. (2004). *Sercemî Berhemî Şakir Fettah - Kitêbî Duwem*, Hewlêr: Aras.
- Dervişcemaloğlu, B. (2016). *Anlatıbilime Giriş*, (2. Baskı), İstanbul: Dergâh Yayınları.
- Dilidüzgün, S. (2007). *Çağdaş Çocuk Yazını; Yazın Eğitiminde Atılan İlk Adım*, (İkinci Basım), İstanbul: Morpa Kültür Yayınları.
- Genette, G. (2011). *Anlatının Söylemi: Yöntem Hakkında Bir Deneme*, F. B. Aydar (Çev.), İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi.
- Grimm, W. (2005). Masalların Özü Üzerine, H. Aydoğan (Çev.), *Hece Aylık Edebiyat Dergisi; Çocuk Edebiyatı Özel Sayısı*, s. 104-105, Ankara, 150-152.
- Heywood, C. (2003). *Baba Bana Top At! Batı'da Çocukluğun Tarihi*, E. Hoşsucu (Çev.), İstanbul: Kitap Yayınevi.
- Izady, M. R. (2007). *Bir Ele Kitabı Kürtler*, (2. Baskı). C. Atila (Çev.), İstanbul: Doz Yayıncılık.
- Jahn, M. (2015). *Anlatıbilim; Anlatı Teorisi El Kitabı*, (2. Baskı). B. Dervişcemaloğlu (Çev.), İstanbul: Dergâh Yayınları.
- Kendo (1913). Çîrokê Kurmanca, *Rojî Kurd*, hej: 2, İstanbul, 31.
- Kıbrıs, İ. (2010). *Çocuk Edebiyatı*, (4. Baskı), Ankara: Kök Yayıncılık.
- Mentik, H. (2013). *Teknikî Firedengî le Romanî Kurdî da; Kurmancî Xwarû Salê 2000-2010*, Silêmanî: Birêweberêtiyî Çap û Bilawkirdinewey Silêmanî.
- Oğuzkan, F. (2013). *Çocuk Edebiyatı*, (10. Baskı), Ankara: Anı Yayıncılık.
- Öztaş, G. G. (2011). *Türkiye'de Çocukluğun Politik İnşası*, İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.
- Postman, N. (1995). *Çocukluğun Yokoluşu*, K. İnal (Çev.), Ankara: İmge Kitabevi.
- Rousseau, J.J. (2011). *Emile ya da Çocuk Eğitimi Üzerine*, M. Baştürk-Y. Kızılcım (Çev.), Ankara: Kilit Yayınları.
- Sebrî, R. R. (2010). *Çîrokî Mindallan le Edebî Kurdî da; 1991-2005*, Hewlêr: Bilawkirawekanî Akademîyayî Kurdî.
- Seccadî, E. (1960). *Hemîşe Behar*. Çapî Yekem, Bexda: Çapxaney Me'arif. <https://books.vejın.net/en/book/132> (03.08.2022)

- Sezer, M. Ö. (2016). *Masallar ve Toplumsal Cinsiyet*, (Altıncı Basım), İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
- Subaşı, K. (2018). *Girr û Gallî Mindallanî Kurd; Dîrokçeya Medya û Çapemenîya Zarokan a Kurdî*, İstanbul: Nûbihar.
- Subaşı, K. (2019). *Kürtçe (Kurmancî) Masaların Anlatı Tipolojisi/Tîpolojîya Vegêrana Çîrvanokên Kurdî-Kurmancî*, Teza Doktorayê ya Çapnebûyî, Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- Şecerî, R. (2005). *Edebiyatî Kodekan der Îran*, Tahran: Întişaratî 'Ayarar.
- Şimşek, T. (2014). *Kuramdan Uygulamaya Çocuk Edebiyatı*, (3. Baskı), Ankara: Grafiker Yayınları.
- Temo, F. (1913). *Çîrok, Rojî Kurd*, hej: 1, İstanbul, 25-26.
- Thompson, S. (1951). *The Folktale*, New York: The Dryden Press.
- Tüfekçi Can, D. (2012). *Çocuk Edebiyatı Üzerine Bir Araştırma: Tanımlar, Türler ve Teoriler*, Yayınlanmamış Doktora Tezi, İzmir: Ege Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Xanî, E. (1858). *Haza Kîtab Nûbehar*, M. E. Bayezîdî (Mustensîx), Koleksîyona Alaxandre Jaba ya Petersburgê, Arşîv No: Kurd 22, Petersburg.
- Yavuzer, H. (2012). *Çocuğunuzun İlk 6 Yılı*, 28. Baskı, İstanbul: Remzi Kitabevi.
- Yıldırım, N. (2017). *Îran Edebiyatı; Başlangıçtan İslamiyet'e Kadar*, (2. Basım), İstanbul: Pinhan Yayıncılık.
- Zêdo, Ç. (2020). *Ejderhayê Tirsonek*, İstanbul: Nûbihar.
- Zêdo, Ç. (2023). *Şêrê Bitenê*, İstanbul: Nûbihar.